# Yekem Konferansa Navneteweyî li ser Edebiyata Kurdî

## Derbarê Konferansê de

Edebiyata kurdî di gelek hevraz û nişîvan re derbas bûye. Heke em derhatina edebiyata kurdî ya piştî Îslamê ji zaravayê goranî û ji Kurdên Yarsan bizanin hingî em dikarin sedsala sêyem (P.H.), ku gelek helbestên bi zaravayê Goranî mane ji wê sedsalê, wekî serdema destpêka edebiyata kurdî destnîşan bikin. Lê belê di çax û serdemên din de zaravayên din, wekî Kurdiya Hewramî, Kurdiya bakur (kurmancî) û Kurdiya navrast (soranî), bi erka zimanê standard rabûne ji bo helbestvan û nivîskarên kurd. Edebiyata kurdî di rabirdûyê de ketiye bin tesîra gelek rewt û tevgerên roşinbîrî û dînî û herwiha danûstandina wê digel edebiyatên welatên cîran jî hebûye. Bi vî awayî edebiyata kurdî berê xwe daye rê û dirbên nû û cihê.

Lewma, layenên navborî û gelekên din bûne sebebê wê hindê ku em konferansekê bi rê ve bibin li ser pêşketin û tekamûla edebiyata kurdî ji destpêkê heta îro. Em hêvîdar in ku ev konferans bibe destpêkek ji bo hewlên manend di dahatûyê de da ku edebiyata kurdî bi ronahiya boçûn û ruwangeyên cihê bê tehlîlkirin.

## Armancên Konferansê

- Naskirina layenên cihê yên edebiyata kurdî
- Naskirina fakterên ku tesîrê li stîl û çeşnên cihê yên edebiyata kurdî dikin
- Vekolîna merheleyên dîrokî yên edebiyata kurdî
- Vekolîna asta tesîra di navbera edebiyata kurdî û edebiyata welatên cîran de

## Mijarên Konferansê

- Folklor
- Çeşnên edebî di edebiyata kurdî de
- Vekolîna dîroka edebiyata kurdî
- Stîlên belave di edebiyata kurdî de
- Rewş û payeya zaravayên kurdî di edebiyata nivîskî de
- Danûstandina di navbera edebiyata kurdî û edebiyatên neteweyên din de
- Pêwendiya di navbera edebiyata kurdî û qesrên mîrên Kurdan de
- Kêş û erûz di helbesta kurdî de
- Erk û kardayên kultûrî û civakî yên edebiyata kurdî
- Rexneya çavkaniyên di warê dîroka edebî de
- Edebiyata Zarokan
- Edebiyata kurdî û zimanê standard
- Qaîdeyên edebî di edebiyata kurdî de
- Destnivîsnasî û destnivîsên kurdî
- Asta tesîra rewtên fikrî yên Îslamî li ser edebiyata kurdî (sûfiyatî/irfan, kelam, fiqh, felsefe…)

## Lewnê gotaran

Hemû gotar divê li gorî qaîdeyên gotarnivîsiya akademîk (kurteya gotarê, destepeyvên serekî, destpêk, babet û encam) bêne nivîsandin. Li ser rûpeleke cuda divê agahiyên nivîskarî an jî nivîskaran (navê nivîskarî an jî nivîskaran, kar, pileya akademîk, berhemên çapkirî, e-mail û adresa postayê) bêne nivîsandin.

**Qonaxa nirxandin û biryardanê**

Gotarên ku digihin sekreteriya konferansê dê li gorî mijarên wan bêne pêşkêşkirin bo hakeman û qebûlbûna gotaran dê bi biryara hakeman teqez bibe. Heta kutabûna qonaxa nirxandinê agahiyên nivîskaran bo hakeman nayêne aşkerakirin.

**Berwarên girîng**

- Ragihandina banga konferansê: 7 Cotmeh 2009
- Berwara dawî ji bo şandina kurteyan: 20 Kanûna yekem 2009
- Berwara dawî ji bo şandina gotaran: 20 Adar 2010
- Berwar û cihê konferansê: 5-6 Gulan 2010, fakûlteya wêje û zanistên insanî ya Zanîngeha Kurdistanê – Sine

**Birêveber**

- Navenda lêkolînên ziman û edebiyata kurdî li Zanîngeha Kurdistanê

**Zimanê konferansê:** kurdî û farsî

**Malpera konferansê**: www.uok.ac.ir/kurdlit û www.kurdlit.ir

**Belavkirina gotaran**

- Kurteyên gotarên ku hatine qebûlkirin dê li ser malpera Zanîngeha Kurdistanê û gotarên ku hatine qebûlkirin jî di kitêba konferansê de bêne belavkirin.

**Lijneya Zanistî (bi rêza alfabetîk)**

- Ednan Berzenjî — Lêkolînerê edebiyata kurdî
- Salêh Edîbî — Mamosteyê Zanîngeha Kurdistanê
- Jemal Ehmedî — Mamosteyê Zanîngeha Azad li Sineyê
- Mohemmed Khalid Gheffarî — Mamosteyê Zanîngeha Azad li Sineyê
- Mohemmed Iranî — Mamosteyê Zanîngeha Kurdistanê
- Jemîl Jeferî — Mamosteyê Zanîngeha Kurdistanê
- Rehîm Loghmanî — Lêkolînerê edebiyata kurdî
- Newîd Neghşbendî — Mamosteyê Zanîngeha Kurdistanê
- Seyyêd Ehmed Parsa — Mamosteyê Zanîngeha Kurdistanê
- Mohsên Pîşwayî — Mamosteyê Zanîngeha Kurdistanê
- Mansur Rehmanî — Lêkolînerê zimanê kurdî
- Abdolah Resoulnejad — Mamosteyê Zanîngeha Kurdistanê
- Hadî Rêzwan — Mamosteyê Zanîngeha Kurdistanê
- Majêd Merdux Ruhanî — Lêkolînerê ziman û edebiyata kurdî
- Bextyar Sejjadî — Mamosteyê Zanîngeha Kurdistanê
- Hesen Serbaz — Mamosteyê Zanîngeha Kurdistanê
- Es'ed Şeyxehmedî — Mamosteyê Zanîngeha Kurdistanê
- Hadî Yusefî — Mamosteyê Zanîngeha Peyamê Noorê Kurdistanê

**Sekreterê zanistî yê konferansê**

- Necmoddîn Cebbarî Mamosteyê Zanîngeha Kurdistanê

**Sekreterê birêveber ê konferansê**

- Abdolah Resoulnejad Mamosteyê Zanîngeha Kurdistanê

**Bi hevkariya**

- Zanîngeha Peyamê Noor li Kurdistanê
- Birêveberiya giştî ya Kultûr û Irşada Îslamî ya Kurdistanê
- Şaredariya Sineyê

---

**Navnîşan:** Zanîngeha Kurdistanê, Sanandaj, P.O.Box: 416, Iran
Fax: +(98)871 6624007 e-mail: KurdLit@uok.ac.ir